


Li Almanya dijberên
faşîstan givaşên li ser
dewletê zêde dikin

»»» R:7



Pêşmerge û hizra
netewî

»»» R:3



Pêşmergebûn
rûmeta mirovê
şoreşger

»»» R:4



Bozanê (Ayn
Issa) di nav bazara
Tirk û Rûsan de

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (388) 22-12-2020 Buha (1000) Tûmen

Meznahiya gel

Roja Şemî 12'ê
Kana Pêşîn,
bi beşdariya beşek
ji Endamên Rêber-
atiya PDKÎ û beşek
ji hêzên “Pêşmerge
Kurdiştanê”, rêûres-
meke bicoş bo roja
“Pêşmerge Kurdiştanê”
li çiyayên Kurdiştanê bi
rê ve çû.

Despêka Rêûresmê
bi sana leşkerî ya
hêzên “Pêşmerge
Kurdiştanê” û piştire
sirûda “Ey Reqîb” ji
aliyê hêza “Pêşmerge
Kurdiştanê”ê ve dest pê
kir, û piştire çend xulek
bêdengî bo rêzgirtin ji
canê paqij ê şehîdên
Kurd û Kurdiştanê û bi
sondxwarina niştîmanî
ya hêza “Pêşmerge
Kurdiştanê” hate berde-
wam kir.

Li beşa duyem
hêza Pêşmerge
bi rêjeya taybet a
pêşmergeyatiyê û
sandîtînê, rewşeke tay-
betî dabûne rêûresmê,
û amadebûna wan
hêzan da xuyakirin.

Beşa din a rêûresmê
ku pêkhatibû ji
pêşkêşkirina pey-
amekê ji aliyê cihgirê
duyemîn yê Lêpirsyarê
Giştî yê PDKÎ “Mi-
hemednezîf Qadirî”
ve bi hilkefta roja
pêşmerge.

Navbirî di vê pey-

amê de, tevî îşarekirineke kurt bi dîroka pir ji evraz û nişîv a xebata Hêza Pêşmerge û aliyên wê yên
dîrokî, pêdegirî li ser rola pêşmerge li qonaxên cuda yên xebata Kurd de kir û baseke hûr li ser pêgeha
pêşmerge li asta navxwe û navnetewî de kir.

Piştî peyama “Mihemednezîf Qadirî” pêka resma salane ya lewha rêzgirtina 20 sale ya taybet bi wan
pêşmergeyan ku heyama 20 salan li çeperên berxwedan û berevanîkirin ji kerameta netewa xwe beşdar
bûn, ji aliyê Berpirsê Dezgeha Fermandehiya “Hêza Pêşmerge” ve hatin xelatkirin.



Di rêûresma îsal de, 6 hevalên pêşmerge yên ku ew lewhe bi wan hatin pêşkêşkirinê ev in: “Selîm Ze-
ncîrî, Walî Dirûdî, Osman Mîstefapûr, Serdar Osmanî, Star Îbrahîmî û Şehriyar Emînpûr”.

Piştire xelat li ser serketiyên kêbirkêya siyasî û leşkerî ya Hêza Pêşmerge de hatin dabeşkirin, ku li
heyama derbasbûyî û li nêzbûna roja “Pêşmerge Kurdiştanê”ê di warên siyasî-hizrî û leşkerî de bi rê ve
çûbû.

Hevdem digel birêveçûna wê rêûresmê, rêûresma bidawîhatina dewreya 245 a destpêkî ya pêşmerge
hate lidarxiştin ku di heyama çend mehên derbasbûyî de fêrxwazên amda li fêrgeha ser bi Fermandehî
ya Hêza Pêşmerge, waneyên siyasî û nizamî xwendibûn.

Ji bilî wan rêûresmên ku me îşare pê kirin, di heyamên derbasbûyî de û li nêzîkbûna roja Pêşmerge
Kurdiştanê, têkoşerên rêya azadiyê, û dilsojên gel di navxwe a welat de bi lidarxiştina çalakiyên cur-
bicur yên banghêjî û bilindkirina alaya Kurdiştanê, belavkirina tirakt û poşterên taybet bi wê rojê û
çendîn çalakiyên din û şandina peyamên pîrozbahiyê bo PDKÎ û nûkirina peymanê emegnasiyê digel
şehîdên Kurd û Kurdiştanê, li gund û bajarok û bajarên Kurdiştanê rêz ji wê roja niştîmanî girtin.

Sergotar

Nehvêd şevên dirêj

N: Kerîm Perwîzî

Rejekê an şev û nîveşevê, jinek li ciheke cîhanê, yan li qewareyeke piçûktir ji Kurdistanê, sancûyan digre û çend kes ji xizm û kesên wê li dora wê kom dibin, her kes li wir nîgeranê dayîkê ye ku bi silametî ji wê janê rizgar bibe û zaroka wê jî bi selametî û bê pîrsgirêk ji dayîk bibe. Mezintirîn xem û nîgeranî di wê demê de, bi silametî derbasbûna dayîk û zaroka wê ji wê qonaxa dijwar e ku yekem qîjîna zarokê gihîşte guhê xizman, her kesê bêhneke asûde kêşandin û bi giryana zarokê ken hate ser lêvên wan.

Di wê demê de ku sala 1309an a Rojî bû, dirêjtirîn şeva salê li bajarê Urmiyê, malbata xwedîpêgeha civakî li gundê Qasimlo, li mala “Mihemed axa” kom bibûn û çavniherê jidayîkbûna zarokê bûn, bi tenê hizra vê yekê dikirin ku dayîk û zarok bi silametî ji wê qonaxê derbas bibin û kesê hizra vê yekê nedikir ku paşeroja wî zarokê dê çawa be.

Piştî wê şevê ku dirêjtirîn şeva salê bû, heta niha 90 şevên wekî wê anku 90 “Yelda” û dirêjtirîn şevên salê derbas bûne û mixabin ew xortê jidayîkbûyê şeva “Yelda”yê li yek ji şevên dirêjtirîn rojên havînê bi destê terorîstên ku ji aliyê “wilayeta Feqîh” yê rûniştîyê Tehranê ve hatinî şandin şehîd kirin, lê ya ku jiyaye û dijî, hizir, dîtingeh û baweriyên wî xortê nîştîman û mekteba hizra wî ye ku ne tenê di gundekî de sînodar nemaye, belkî Kurdistan û Îran li xwe girt û dengvedana navnetewî hebû.

Dr. Qasimlo li dirêjtirîn şeva

Yekîtiya Jinan bi hilkefta roja Pêşmerge rêz li jinên pêşmerge girt



Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdistanê Îranê bi hilkefta 26`ê Sermawezê roja Pêşmerge Kurdistanê destegulên rêz pêşkeş bi jinên pêşmerge yê Kurdistanê kir.

Di heyama rojên derbasbûyî de bi hilkefta 26`ê Sermawezê, roja Pêşmerge Kurdistanê, Komîteya Yekîtiya Jinan bi pêşkeşkirina deskegulan, rêz li keçên pêşmerge û herwisa hêzên Pêşmerge Kurdistanê li çiyayên Kurdistanê girt.

Li rojên 19, 23, 24, 26 `ê Sermawezê, Komîteyên “Yayan, Nesrîn Qasimlo, Mîna Xanim, komîteya Herman” ji Yekîtiya Ciwana û herwisa birêveberê Yekîtiya inanan bo rêz girtin li kar û xebata pêşmerge Kurdistanê deskegul wekî sembola rêz pêşkeş bi pêşmergeyan kir û hêvî xwestin ku li xebatê berdewam bin.

salê de ji dayîk bibû û bi têkoşîn û hizir û bawera xwe, dixwest şeva dirêj a li ser Kurdistanê bi dûr bixe û tarîtiya sepandî li ser welat birevîne û bi tîrêjên rojê, netew û nîştîman ronahî û gerim bike û keskatî û avedanî û jiyanê berhem bîne.

Dr. Qasimloyê egîd bi sedan ziman dizanîn, ne bi tenê zimanên wekî Îngilîzî û Feransî û ...hwd, belkî zimanê girûp, û tex û qatên cuda yê civakê dizanî, û hem jî şarezayê zimanê mamostayên zanîngeha “Parîs” û dîplomatên Almanî bû, û hem jî zimanê werzêr, kedkar, kasibkarên Kurd, serbazê Tirk, efserê Fars û wezîrê Erebb û bi dehan girûp û qatên din yê civakê şareza bû, û bi zanîna wan hemû zimanan, ne ti tiştêk cuda nedigot, belkî di hemûyan de li pey yek binyat û yek rêya bextewerî û azadî û dadperweriya Kurdistan û serweriya netewa Kurd digeriya.

Ya ku xortê jidayîkbûyê şeva Yeldayê ava kir, niha mektebeke bilind û berfireh bi berfirehiya Kurdistanê ye, û çavkaniya hêz û hizrê bo xortên wî welatî ye ku dixwazin azad, serbest û wekhev li ser axa xwe bi serweriyê ve bijîn.

Yeldaya we pîroz be

Pêşmerge û hizra netewî



N: Nûredîn Sofîzade

Beriya vê ku em basa pêşmerge bikin, hewce ye basekî giştî derheq mirovên şoreşvan bikin, ku di her cihekê û renga di nava her civatgehekê de, dema ku zilm û zordarî hebe û mafê parek ji xelkê wê civatgehê bête zevtkirin, hin kesên xwedî xîret û netirs li hember wê zilm û bê mafiyê serî hildidin û dibine pêşeng û gorî awayê mumkin xebatê dikan bona bideştveanîna mafê wê civatgehê, belê ew kesane dibine pêşeng û li ber vê ku tenê daxwaza mafê xwe yê kitekesî nakin û daxwaza mafê parek ji civatgehê dikan, lewma ji aliyê wê civatgehê ve tene pişgîrîkirin û xelk wan bi xebatkarê xwe dizane.

Ew kesane renga yek ji awayê xebatê weke siyasî, medenî, çandî, teblîxî, beşdarî di piroseya hilbijartinê de, teblîxî, mediayî, rêkxistinî, sinfî, û yên dinê de... Ew kesane jêre dibêjin xebatkar û pêşengê daxwaziya maf, îcar ew mafa çi warekî bi xwe ve bigre.

Lê dema ku hemî cure mafên civak û netewe û xelkekê hatibine zevtkirin, li warê çand, ziman, nasname û axa wan hatibe dagîrkirin, renga hinek kesên cesûr û xwedî heşt nekarin rûnên û temaşevan bin û bona gihîştin bi maf û azadî û rizgariya ax û netewa xwe, bi awayekî radîkal deşt diavêne çekê û li hember dagîrker çalakiyan dikan, ew kesên bi vî awayî xebatê dikan, ew şoreşvanê nava gelê xwe ne.

Bê guman nabe eva jî bête jibîrkirin ku ew şoreşvanane jî bi neçarî renga deşt bo çekê biribin, ji ber vê ku dagîrker

û aliyê maf zevtker derfet û mecal û azadiya xebata siyasî û medenî nedaye wan, û dagîrkerê hakim sîstemekî totalîter û dîktator û xwesepên girtiye bera xwe û her rêkekî xebata aştiyane dayêxiştiye.

Netewa Kurd di Kurdistanê de digel dagîrker û deshilatên dîktator hember in û ew rejîmane jî derfeta çi yek ji rêkên xebata aştiyane û demokrasî û rêkxistinî bo gelê Kurd nehêlane û bi hêz û êrîş û kuştin û girtinê, berdewam cehd kirine ku dengê mafxwaziya Kurdan mat bikin û berdewam înkara her mafek Kurdan dikan.

Wê demê ye ku hinek kesên xwedî heşt û tēgiheştî û seh bi hemî mafên zevtkirê yên netewa xwe ji aliyê dijminan ve dikan, bona man û mewcudiyeta Kurd û Kurdistanê, bona bēdeng nemana li hember bê mafîya netewa xwe, bona vê ku bo dijmin û dakîrker bide xuyakirin ku ew heta bi yekcarî li hember dagîrkari û înkara mafên xwe de bê deng namîne û berdewam e li ser mafxwaziya xwe, gelek bi zanebûn û bi hizra bilind a netewî, deşt didine çekê û gorî îmkan û derfetan xebatê dikan û amadene bona paraştina gelê xwe, heta canê xwe jî gorî bikin, ew kêne û jêre çi dibêjin? Ew cem gelê xwe bi pêşmerge hatine naskirin.

Ku wisa ye bi baldan bi basa serve, îsbat dibe ku pêşmerge û şoreşvanê Kurd, tenê mirovekî çekdar û şerker û yaxîbûyî nîne, belkî pêşmerge gelek agahane bi heştîkirin ji hemî bêmafîya netewa xwe, bi dagîrkariya Kurdistanê xwe, bi heştîkirin ji qedexebûna nasname û ziman û çanda netewa xwe, bi heştîkirin bi zilm û zordarî û asîmîlasyona dijminan li ser gelê xwe, amade dibe ku bibe pêşmerge û ji rêka wan armancan û bideştveanîna wan mafên zevtkirî yên netewa xwe amade ye canê xwe jî gorî bike.

Ku wisa ye pêşmerge kesek



e ku mirov hekî mafê tewaw ê pênasa pêşmerge bide şoreşvanê Kurd, dibêje ku pêşmerge, mirovekî agah li warên siyasî, çandî, netewî, dîrokî, nasname û dijminnasînê ve tewaw pê giheştîye û baş dizane ku nirxa bideştveanîna wan mafan giran e, û dibe gelê wî ji navçûnê bête paraştin, her lewma pêşmerge amade dibe mergê xwe pêş merg û jinavçûna gelê xwe dabînê.

Berevajî propaganda jehrawî û qirêj a dijminan, ku wisa didine xuya ku pêşmerge tenê çekdarek û bes, belkî pêşmerge pêşengê xebata rizgarîxwaziya netewa xwe ye, pêşmerge alahilgirê xebat û teslîmnebûna li hember dijmin e. Pêşmerge ji bilî

çekdarekî/ê şoreşvan, xebatkarek siyasî, medenî, çandî, perwerdehî, rekxistinî, xwediyê waneya welatperwerî û geldoştîyê ye. Bi kurtî pêşmerge remz û sembol û rêberê me'newî yê gelê xwe ye û cihê hêviya Kurdan e.

Di dawiyê de bi hilkefta 26ê Sermawezê roja Pêşmerge Kurdistanê, hemî pêşmergeyên qehreman ên Kurd, malbatên şehîdên serbilind ên Kurd û hemî gelê kurd pîroz dikim.

Heta Kurd û Kurdistan û şoreşvanên weke pêşmerge hebin, bê guman dê weke neteweyekî zindî û serbilind her bimîne.

Bijî Pêşmerge



Pêşmergebûn rûmeta mirovê şoreşger



N: Serbest Urmiye

Hemû neteweyekê li qada xebata neteweyî û xebat di pêxema bideştveanîna mafên xwe yên neteweyî de, merivên xwedî hizir û pêşkevtinwaz hebûne ku di pêxema azadî û mafên gelê xwe de canê xwe gorî kirine û amadeyê hemû fedakariyekê bûne. Di dîroka gelê Kurd de jî ew merivê xwedî hizir û şoreşger bi navê pêşmerge hatiye pênasekirin. Heke em mêzeyê dîroka xebata mafxwazî ya gelê Kurd bikin, pêşmergebûn ne tenê weke nav, belkî weke rûmetekê ji mirovên şoreşger re hatiye dayîn. Rûmetek ku biha û nirxa mirovê şorîşger ew qas bilind dike ku çepera pêşmerge bibe helûn û hêviya hemû şoreşgerên Kurd. Lê ya ku pêşmergebûnê ji nav û pênaseyê ve diguhere û di asteke herî bilind de dike rûmetek ji şoresê û şoreşger re, ne tenê çek û dirûşmên azadaîxwazî û şoreşgerî ne, belkî hebûna komê ji taybetmendî û esl û rêşaya ne ku rûmeta pêşmerge didin şoreşger.

Di heman demê de ku pêşmerge di dîroka gelê Kurd de parêzerê axa welat û kerameta mirovê Kurd bûye, di heman demê de jî pêşmergeyê fêrgeha komê ji taybetmendiyên bilind ên mirovî û neteweyî bûye ku di jêr de em dê bi kurtî bal bikeşînin ser.

1. Exlaq û pîrensîp: Di fêrgeha pêşmergebûnê de, pîrensîp û bi taybetî pîrensîpên bilind ên exlaqî, ciheke taybetî û girîng hene. Di hizir û bawerîya Pêşmerge de, bi hev re girêdana exlaq û siyasî weke esleke zaniştî û hewce di hemû qad û astên

xebatê de hatiye pênasekirin. Bi vî awayî, pêşmerge wate xebatkarekî/a siyasî yê/a xwedî exlaq û derwest e ku hertim xwe li hember netewa xwe, civak û mirovahiyê de berpirsiyar dizane.

2. Bawermendî û fedakarî: Hebûna baweriyê bi armancên siyasî û mirovî yên xebatê esleke berçav e di tekoşîna mirovên xebatkar de. Mirovê ku bawerî bi rêbaz û armancên xwe hebe, amade ye ku heta serkevtinê, di pêxema gihîştin bi armancên xwe de hemû core fedakariyekê jî bike. Lewma ye em dibînin ku çepera pêşmerge hertim pîr e ji mirovên xwedî bawer û dîroka pêşmergeyê te jî ye ji qehreman û fedakarên ku di rêya serkevtina doza gelê Kurd de bi xwîna sor ala xebatê neqîşandine.

3. Guhertinwazî: Ji ber ku xebata pêşmerge xebateke tevalî ye li hemî qadên jiyan û civaka Kurdistanê, nemaze di qada siyasî de û ji aliyeke din ve ji ber ku guhertin armanca sereke ye di siyasî de, lewma guhertinwazbûn weke esleke girîng ya xebat û kesayetiya pêşmerge tê zanîn û perwerdekirin. Di vê derheqê de jî fêrgeha pêşmergebûnê hertim di hewilê de ye ku



zanişt pêşmergebûnê di asteke bilind de ragire. Ev jî ji ber vê çendê ye ku di rastî de zanişt e ku guhertinan tîne holê û mirovê lêzan e ku pêvajoya guhertinê îdare dike.

4. Raştbawerî: Di fêrgeha pêşmergebûnê de, mirov wiha tê perwerdekirin ku hertim her tişt û bûyerekê li gor rastî û faktên rojevê bide şirovekirin û hêlengandin. Wate aliyên lawaz û bihêz di hemû pêngeheke tekoşîna xwe de weke heyî berhev bide û piştî biryarê li ser bide. Ev taybetmendiye jî dibe sedem ku helwest û pêngehên xebata pêşmerge û hertim li gor hewcehiya qonaxa xebata civakê be û ked û kesayetiya pêşmerge hertim di rojeva xebatê de were nixandî û şirovekirin.

Zêde ne ev taybetmendiyan ku pêşmergebûn ji mirovên xebatkar re dibin rûmetek û derbasî nava hizir, raman û wêje û pênaseyên şûnasa neteweyekê dikin, bi qasekê ku yek yan çend deq û rûpel nikarin wan pênase bikin. Ya ku rûmet û şanaziya pêşmergebûnê dide selimandin, hitbar û bawerîya berfireh û bêşînor a gel e bi pêşmerge. Ji bo selimandina vê rastiyê, meriv dikare rengvedana xebat û fedakariya pêşmerge di lawîk û heyran, helbest û sitran û wêje û dîwanên gel de weke fakt bîne.

Serkeve xebata rizgarîxwaziya gelê Kurd, bi pêşengiya Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê.

Pîroz be 26`ê Sermawezê, Roja Pêşmerge Kurdistanê

Pêşmerge di serdemê Rasana Rojhilatê de



N: Elî Munezemî

Terma paraştina netewî wek hizrek bingehîn yanî destnîşankirina hemû wan alavên siyaseta paraştinî ya netewî û pêwendiya wan alavan bi hev re bo armanca bergirî ji gel û welat bi baştirin awa. Di Kurdiştanê de bi sedema nebûna serweriya netewî û demûdezhgehên hewce yên dewletî yên Kurdî, ev yeka pêşmerge û endamên hemû partî û rêkxistinên netewî, ewên ku hazir in wek hêza berevankar li xelk û xaka Kurdiştanê berevaniyê bikin, ewên ku dixebitin bo ku bizanin ka dijmin çawa hizir dike û yan bi dijî neteweya me tevdigere, ewên ku kar dikin bo dariştina pîlanên stratejîk ku çawa dibe Kurd bi tehlûke û tehdîdan re rû bi rû be û eva ku di pêşerojê de sîstema bergirîya netewî dibe çi heykel yan qewareyek hebe, li xwe digre.

Xêncê wê yekê, hemû ew kesên ku cehd dikin bo xurt-tirkirina faktorên netewesaziya kurdan û paraştina jîngeh û samanên sirûştî û berjevendiya kurdan, di bin wê pênaseyê de cih digrin. Ewa ku mebesta meye di wê kurte nivîsînê de li ser pêdagirin û zêdetir zelal bikin, rola pêşmerge wek hêza sereke ya paraştina kurdan e di qonaxa nû ya xebata netewî di Rojhelatê Kurdiştanê de ku bi Rasana Rojhelat hatiye binavkirin.

Rasana Rojhilatê ku di ne-wroza 2716an bi peyama Sekreterê wê demê yê PDKÎ li ser çiyayên Kurdiştanê bi fermî hate ragihandin, dida eyankirinê ku Rojhilatê

Kurdiştanê bo pêşxistina xebata xwe ya netewî hewceyî bi stratejiyek nû heye ku bikare li gor zirûfên serdem û ew alozî û fersendên ku li ber dest de hene, cehd bike ku li yek demê de li zoraniya potansiyela xwe mifah werbigre.

Ew stratejiya xwediyê xwendinek realîstane bû ku cehd dikir hêza xwe li her sê meydana sereke yên xebatê, an ku li hundirê Rojhilatê Kurdiştanê, hêza pêşmergeyên Kurdiştanê li ser çiyayên Kurdsitanê û hêz û şiyana Kurdên Rojhilatê li diyaspora di yek hêlê de kanalîze bike. Xuya ye ku di wê proseya de, pişka herî giran ya erkê xebatê ketiye ser milê pêşmergeyan an ku pêşmergeyên li ser çiyayên û pêşmergeyên hundirê Rojhilatê Kurdiştanê de ku bi «pêşmergeyên Bajar» tên naskirin. Tam li ber wê hegerê ye ku ew hereketa bi «Rasana çiya û bajar» tê naskirin û bo xebata li diyaspora jî «Rasana Tarawge» tê bikar anîn.

Rasana Rojhilatê paradîgmek nû li xebata gelê Kurd di Rojhilatê Kurdiştanê de ye. Lê ew yek her dirêjahiya xebata berê ya gelê me ye bi awayek nûjentir û serdemiyantir. Ew xebata çekdarî ku pêştir semxatirê hindê sedemên xasmanî hatibû sekinandin, dîsa hate aktîvkirin û pişkên din yên xebatê jî li gor alav û îmkânên roj, hatin nûjenkirin. Gava ku stratejiya nû hate rojevê, pêşmerge wek matora wê hereketê, bi îrade û moralek bilind ve milê xwe xiste bin barê wî erkê giran û bi hizûra xwe ya berdewam, hazir bû ku nirxek giran ji bo wê hereketê bide û da eyankirin li dost û dijminan re ku her pêşmerge ye ku layiqê wî navê mezin e, her ew fidakarî û ji can derbabûne ye ku ew kiriye xweştevî û hezkiriyê gelê xwe, her ew e xweşmêrê tolhildanê û dijmin tevizandinê û her ew e hêza derêxistina dagîrkeran li welat. Bizava Kurdan li Rojhilatê bi

xebata qonaxa Rasana Rojhilatê sê armancên girîng bi dest xistin: Ya yekemîn eva bû ku hêviyek mezin zivirande bo gelê me ku piştî 20 salan rawestana xebata çekdarî, di çavnehîriyê de hêlana xelkê û propagandeya dijmin bi dijî bizava gelê me, gelê me li Rojhilatê xwe bi tenê didît û hêviya wan lawaz bibû. Ya duyemîn jî, dijmin ku jêvebû xebat bi yekcarî ji nav çûye û êdî şiyana rabûna ser piyan bo carek din nîne, têgihîşt ku her demekê gelê Kurd îrade bike, bi hezaran keç û xort amade hene ku bo berevanî li gel û welatê xwe, li can û hemû xweşiyên jiyana xwe derbas bin û bê şik û dudilî hember dijminê xwînswar û bi dûr li nirx û prensîpên merivane, bisekînin û berxwedanê bikin. Armanca sêhemîn ew bû ku li pênaseya Rasanê de ye, ewa ye ku eger çi PDKÎ destpêka Rasana Rojhilatê ragihand, lê ew ne milkê partî yan aliyekê ye, belkî ya hemû hêz û hereketên Kurdî yên neteweyî di Rojhilatê de ye û xebata wan jî wek pişkek li Rasanê dide hesibandin. Ew nêrîna ploralîstî bo xebata gelê kurd ku cudahiyên navbera partî û rêkxistinan didane qeraxê û li ser xalên hevpar pêdagiriyê dike, bilindtirîn asta têgihîştin û heşt bi perpirsayetîkirina stratejîstên Rasanê dixe ber çavan.

Rasana Rojhilatê di heyamê temenê xwe yê kurt de, heta niha baş kartêkeriya xwe nîşan daye û Hêza Pêşmerge karî carek din asta heştê netewî di cem keç û xortên kurd bilind bike û bi hezaran rakşîne bo nav refê şoreşê û wan di refên pêşmergeyên çiya û bajar de birêkxistin bike. Hizûra Hêza Pêşmerge di hundirê Rojhilatê de da nîşandan ku eger pêşmerge li meydana sereke ya xebatê de be, gelê me jî her wek caran û bigre li caran jî zêdetir, amade ye piştevaniya wan bike û eger hewce be, nirxa wê jî bide. Ew raştiya jî bi hizûra pêşmerge li hundirê Rojhilatê de hate selimandin ku



çi hêz û qavetek nikare gel û pêşmerge li hev veqetîne. Ji ber ku pêşmerge bo gel dixebite û gel jî pêşmerge bi zarokê xwe yê herî xweştevî dihesibîne û qedrê wan zehmet û têkoşîna wan ku bo azadiya gel û welat û zivirandina kerameta merivane bo hemû takên kurdiştanî ye, digre û xelk jî pêka şiyana û îmkânên xwe hazir di wê rêka dijwar de bo pêşmerge alîkar bin.

Rasanê xêncî ew tiştên ku li serwe de hate baskirin, di qada navnetewî de jî mesajên baş bo hemû gelan li cîhanê de şand. Rasanê da eyankirin ku dijminê gelê Kurd – Komara Îslamî a Îranê- di heyamê bişt salan sekinîna şerê çekdarî ê rewşa hêz û hereketên Kurdî bi wê mebestê ku şansê bidin bi wê dijminê xwînrejî ku bikarin di bin sîbera aştiya nerênî û nemanî şer de rewşa azadî, aşî û dadperweriyê di Rojhilatê Kurdiştanê de baştir bikin, lê mixabin wan li wê derfetê berevajî wan armancan mifah wergirit û tenê cehd kirin Kurdiştanê zêdetir milîtarîze bikin, torên xwe yên sîxurî û terorîstî tede bihêztir bikin û saman û serweta Kurdan hêsantir li caran talan bikin. Rasaniyan selimand ku eger berevaniya rewşa nebe, ew dijmîname hemû armanca wan ewa ye ku Kurd û Kurdiştanê bi yekcarî qir bikin. Lê ew xewna dijmin bi wê têkoşînê û stratejiyê ku di bin navê Rasanê de kete rojevê, li ser dilê dijmin bû kul û hêvîdar im ku yê her bi wê kulê jî bo hertimî ber bi aliyê nemanê ve here.

Bi hilkefta roja pîroz a pêşmerge, silav li hemû pêşmergeyên netewehez û nîştimanperwerên Kurd û Kurdiştanê û serkevîna wan di xebatê te hêviya me ye.

Pêşmerge parêzerê nasnameya gel e



N: Dara Natiq

26`ê Sermawezê roja pêmerge û rêz û hurmetgirtin ji pêşmerge Kurdiştanê ye. Ew xebatkarên ku bibîr û hizrên pêşkevînxwazane yên xwe bo bideştixistina mafên neteweyî yên gelê Kurd heyî û jiyana xwe gorî kirine û amade ne ku di pêxema azadiyê de canê xwe jî gorî bikin. Peyva bi heybet û pîroz a pêşmerge kalayeke kêrê bejin û bala çekdarê bi bîr û bawer yê Kurd, navekî hêjayî wî û guncaw digel fîdakari û cangorîtiyên pêşmerge, weke pêşeng û pêşrewê gel û cihgirtî di çepera herî pêş a xebatê de ye.

Nav, armanc û peyama azadî û aşîxwaziya pêşmerge, her tim bûye sedema tirs û xofek mezin di nava dilê dagîrkerên Kurdisatê û dijminên azadî û wekhevî û mirovatiyê. Dîroka berxwedan û serboriya neteweya Kurd ew yeke daye xuyakirin ku, heya zulm û zordarî û dagîrkari bi ser Kurdiştanê de bimeşe, xebat, berxwedan û cangorîtiya pêşmerge weke sembola azadî û paraştina keramet û nasnameya neteweya Kurd yê hertim berdewam be.

Pêşmerge pêşengê xebat bo jiyanê baştir bo neteweya xwe ye, wate hevdem digel hilgirtina çekê, hilgîrê baweriyê mirovdostane ya siyasî ye, ku bo nirxên bilind ên wekî wekhevî, mafê takekes û giştî jiyanê hêjayî, û dûr ji çewsandin û dûr ji ferq û cudahîdanîne tekoşînê dikan,

û her yek ji wan nirxan pêkhînerê qewareyêke siyasî û hizrî ne, ku felsefeya hebûn û jiyana pêşmerge ji jiyana hêzên din ên çekdar ên birêveberê her fermanekê cuda dike.

Şer û xebata pêşmerge li hember dagîrkari û terorîzm û tundajoyiya herêmî, nasname û giraniyek cîhanî daye heybet û felsefeya azadîxwaziya pêşmerge, û di navendên xwedîbiryar ên dunyayê de, weke peyamnêr û xebatkarên

xwe nîşan bide. Ji ber ku pêşmerge Kurdiştanê tevî hilgirtina çeka parêzgarî ji nirxên me, pêşengeke siyasî ye, ku digel vê ku destûr û biryarên sertir ên xwe bi rê ve dibe, di heman demê de, ew takek e ku şiyana hilbijartinê heye, biryarê dide, pak û napak li gora van nirxên ku pê pêbend e, ji hev cuda dike û di hemberî nedirustiyê de, di her rewşekê de û li her cihêkî be helwestê digre û tekoşînê dike. Pêşmerge, digel ku hêza

cîhanê li dijî tarîti û kewneperestiyê. Pêşmerge, ev navê teji şanazî ye ku ji hemû gelê Kurdiştanê re bûye cihê hêviya pêşerojek geş û bextewer. Pêşmerge, ev navê bi heybet e ku xewa çavên dijminên mirovatiyê revandiye. Pêşmerge, pêşengê tekoşîna ji bo azadî, wekhevî û bexteweriyê, ji bo gelê Kurdiştanê navê herî pîroz, herî bi bandor, herî mezin û herî hêja ye.

Tevger û peyama nû a



aştî û azadî û wekheviyê tîn binavkirin, û xelat bi wan tene bexşin.

Bilindahiya nav û pêgeha pêşmerge, bihêzbûna hêviyên gelê Kurd û mirovahiyê û ew erk û wezîfeya giran lê pîr ji şanazî ku Hêza Pêşmerge û bi taybetî di vê qonaxa hesîtiyar ya xebata çiya û bajar de, wate “Rasan” a Rojhilatê Kurdiştanê girtiye stuyê xwe, hukm dike ku Hêza Pêşmerge û her takeke hilgîrê navê pêşmerge berî destbirina bo çeka xwe, bîr ji berpirsariyê û pêgeha pêşmerge bike.

Dibe hemû ew nirxên ku paraştina wan di Rojhilata Navîn de bi navê bilind e pêşmerge ve hatiye tomarkirin, û bi wî navî ve tê nasîn, di reftar û îradeya hemû pêşmergeyên me de

çekdar ya girêdayê îradeya siyasî ya gelê Kurd e û erka serke ya pêşmerge paraştina ax û gelê Kurdiştanê ye, lê di heman demê de xwedî rolek girîng ya siyasî ye. Pêşmerge, di nava civaka Kurdiştanê de weke pêşengê siyasî, hêviya azadiyê û mînakê herî paqij ya danûstandinên civakî, pêşengê guhertin û veguhertinê, parêzerê wekhevî, asayiş û edaletê tê naskirin. Ji ber wê hindê, navê Pêşmerge, weke yek ji navên herî pîroz di civakê de bilind e û gel bi çavên pîr bi hêvî temaşeyê pêşmerge dike. Ev nav û hêvî, erk û barê li ser milê pêşmerge hê girantir dike.

Pêşmerge, ev navê bi navûdeng e ku êdî sînorê tekoşîna neteweyî li Kurdiştanê derbas kiriye û ketiye nava wêjeya berxwedana

pêşmerge bi stratejiya pêkvegîrêdana xebata çiya û bajar, karî cardin tev pêkhatiyên Kurdiştanê bi hemî tex û qatên cur bi cur yên civakê bixasmanî di nava bajaran de organîze bike, û di bin navê “Pêşmergeyên Bajar”, bi seheke şoreşvanî û neteweyî, li hember doza berheq a gelê xwe xwedî derkevin, û li dijî dagîrkariya rejîma Îranê, liv û tevgera xwe xurtir û bibandortir bikin.

Xebata pêşmerge di çarçoveya stratejiya bi navê “Rasan”ê, û bi rêberiya PDKÎ, hêvî û moralek mezin di nava civaka azadîxwaz a Kurdiştanê de çekir, û bandorek rasterast li ser jêhelbirina seha neteweyî û şoreşvanî a gelê Kurd û yekrêziya niştîmanî û welatparêziyê danî.

Nerîna Lîderan



“Lindsey Graham”:
“Zivirîn bo Bercamê biryarek ka-
vîlker bo Rojhilata Navîn e”.



“Radosław Sikorski”:
“Rejîma Îranê ku îdia dike Kom-
areke Îslamî ye, sivikayeti ye bi ola
Îslamê, çimkî rejîma Îran yek ji
serkurtkartirîn welatê cîhanê ye.”.



“Nikki Haley”:
“Zivirîn bo Bercamê karesat e”.



“Mehmûd Emced”:
“Rêberê Îranê berpîrsê raşterast
yê tev cinayet û kuştinên xelkê ji
sala 1388an ve ye”.

Li Almaniya dijberên faşîstan givaşên li ser dewletê zêde dikin



N: Eskender Ceiferî

Heftiya dawiyê ya meha 12an a sala 2020an dadgeha Almanyayê di dosyeya dosyeya naskirî bi HalleProzess de biryara xwe distîne ku taybet bi têrorîstekî raştgir e ku sala derbasbûyî hin welatîyên biyanî li vî welatî kuştin.

Çalakvanên sîvîl hem namemek radeştî dewletê kirine û hem jî bi belavkirina daxuyaniyekê daxwaza xwepêşandaneke berfirek li pêşberî dadgeha Magdeburgê kirine ku bikuj li wir tê darezandin. Slogana wan jî ev e; “Hevalbendî bi berketiyan re - tawanbar nabe derkeve holê.”

Havîna sala 2020an dosyeya dadgehê li hemberî raştgirê tundrê yê bajarê Halle deştê kir. Wî roja 9ê meha 10an a sala 2019an bi armancên dijatiya Cihûyan, nijadperestî û dijatiya jinan êrîşek li hemberî kinîse û herwisa kababxaneyên Kiez li wî bajarî pêk anî û tê de du kesên bi navên Cana Lanj û Kiwin Şiwartz jiyana xwe ji deşt dan. Wê demê 69 kes di nav kinîsê de bûn ku bi dijwarî karibûn rizgar bibin. Dema ku bikuj direviya, hin kes jî li kolana bi navê Magdeburgerstraße li bajarê Halle û herwisa li Wiedersdorf li nêzikî Landesbergê hatin birîndarkirin ku birîna hin kes ji wan kûr bû.

Piştî 25 rûniştinên dadgehê, niha êdî rûniştin bi dawî tî. Dadgeh bi şandina biryarê, rûniştinê diqedîne lê belê ji bo lihemberderketina êrîşên bi vî rengî yan jî ji bo dijatiya faşîstên nû, hêleke taybet tine ye.


Weke rojên berê yê rûniştinên dadgehê, wê piştî

dawîhatina rûniştinên dadgehê, civîneke din li pêşberî dadgeha Magdeburgê bê lidarxistin.

Çalakvanên sîvîl, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihandine ku armanca wan jî vî civînê, pêkanîna rewşeke hevgirtî ye ji bo kesên ku ji êrîşê hatin rizgarkirin, ji bo malbatên qurbaniyan û herwisa kesên ku gili kirine. Herwisa dibêjin ku em hebûna van pirsyan jî rexne dikin ku bê bersiv mane û rewşa civakê, pêkhatiyên dewletê û raportên ragihandinê di warê tundûtêjiya raştgirî de jî rexne dikin.

Di warê yasayî de, dadgeh di serî de weke tawaneke kesane yan jî taybet dihat lidarxistin. Tiştê ku hatiye selimandin, ev e ku wî ne di rûniştinên dadgehê de kar û kiryarên xwe înkâr kirine û ne jî poşman bûye. Li bendê ye ku ew bi girtîgeha hertimî bê sizakirin. Heya niha gelek pirsyar bê bersiv mane; Heke êrîşa li dijî Aftaks Îbrahîm û Ismet Tekîn weke êrîşên bikujane neyên binavkirin, wê demê ew kes çawan dikarin li pêşberî yasayê, wekheviya xwe bi deşt xwe ve binin. Gelo çima karnas û rojnamevan, li ser mijara raştgirî û çalakiyên li ser hêla Înternê zêdetirî lêkolînerên polîsan dizanin? Kîjan mîkanîzm dikarin ji dadgehê bêne şandin û bikevin pêşberî aliyên dervey dadgehê? Di encamê de jî pirsyar ev e ku di encama wê êrîşê de û bi kiryarên wê, kîjan encamên siyasî û civakî çê bûne? Niha ji kîjan ekteran tê xwaştin ku sersaxiyan bikin kiryar? Nerîn û hêviyên qurbaniyan û malbatên wan ji bo pêşerojê û ji bo lihemberderketina van bûyeran û nirxandina wan çi ne? Pêwîstiya wan bi qerebûkirin û rêzgirtinê çi ye?

Ew sazî di daxuyaniya xwe de didin xuyakirin ku em dixwazin heftiya dawiyê ya meha 12an di civînekê de li pêşberî dadgeha navçeya Magdeburgê mijûlî van



pirsyan û hin pirsyarên din bin. Nerîna kesên ku gili kirine û herwisa kesên ku ziyan li wan ketiye wê bêne nirxandin. Herwisa biryar e rewşeke din ji bo rêzgirtinê ji Cana û Kiwinê bê pêkanîn. Ji bilî wê, karnasên ku dosye şopandine, wê kurteyekê amade bikin.

Di beşeke din ji daxuyaniyê de hatiye ew tiştê ku li bajarê Halle çê bû, take tiştê nebû ku rû da. Ew, mijara beşek ji berdewamiya siyasî ya tundûtêjiya raştgirî ye. Heyameke kin piştî wê êrîşê ku li bajarê Halle çê bû, sala 2020an jî êrîşeke nijadperestî li bajarê Hanau çê bû ku di encamê de 10 kesên jiyana xwe ji deşt dan. Nerîna faşîstî, dijatiya Cihûyan, nijadperestî, dijatiya jinan û regezxwazan, di kevanan vî civakê de hatiye berfirehkirin. Em pêşbînî dikin ku bikujê Halle, heman kiryar pêk anîye ku gelek kes li vî welatî li vî karî difikirin.

Rêkxistinên sîvîl di dawiya daxuyaniya xwe de ragihandine ku ew, take tiştê nebû ku çê bû û take bikuj jî nebû, ku heye! Tevlî xwepêşandaneke heftiya dawiyê ya 12an bibin û van peyaman bi xwe re binin; Hevalbendî bi berketiyan re - tawanbar nabe derkeve holê! Roja ku biryar ji aliyê dadgehê ve tê şandin, em dixwazin bi we re li kolanan hevgirtî bin! Ji ber ku li gor me, dawîhatina proseya dadgehê, nayê wateya dawîhatina êrîşê û wê civakê ku ew kiryar pêk anîne.

Di vî çalakiyê de 11 sazî û rêkxistinên dijberên faşîstan li Almanya û Ewropayê bi giştî beşdar in û ew ji dewletê dixwazin bi danîna sînoran ji partiyên raştgir re, êdî dawiyê li nijadperestiyê bîne.

Bozanê (Ayn Issa) di nav bazara Tirk û Rûsan de



N: Ebdulazîz Qasim

Bazar li ser deverên kurdî bûye xala hevbeş û lihevkerinê di navbera rejîma Sûriyê, opozisyona Sûrî, rejîma Tirkîyê û Rûsya de, û kurd dibin qurbanîyên van bazarên şer û şerxwazîyê û rêkheftin û girêbestên wan li ser hesabê kurdan tene girêdan. Wekî heman bazara reş ya li ser Efrînê, û paşî li ser Serêkaniyê û Girêspî bûyîn, ku îro li gel bêdengiya Amerîka û YE, bazara careke din li ser Bozanê “Ayn Issa” dibe.

Li gorî raporteke “Rewangeha Mafên Mirov ya Sûrî” ku di roja 21.12.2020’ an civînek li gundê Şirkakê li nêzikî bajarokê “Bozanê” ji bo diyarkirina çarenivîsa vê deverê di navbera efsêrên Rûsiya û Tirkan de hate lidarxistin, lê heta niha tiştek nehatiye ragihandin, hevdem ku car car şer û pevçûn di navbera hêzên HSD û çeteyên Tirkîyê de li ser çeperên Bozanê û gundên wê bi dijwarî diqewimin.

Li gorî hin çavkaniyên kurdî, ku civînek li ser rewşa “Bozanê” li bajarokê Rimêlan li gel Amerîkiyan hate lidarxistin û têde Amerîkiyan got ku wan ti pêwendî bi rewşa niha ya li Bozanê nîne, û got ku rewşa wê girêdayî bi rêkkftina di navbera “Rûsiya, rejîma Sûriyê û Tirkîyê de ye, û heta nivîsîna vê gotarê jî hêj tiştek nehatiye ragihandin?.

Helwestên Tirkîye û rejîma Sûriyê ji doza kurdî xuya ne, herwisa helwesta Rûsyayê jî xuya ye, ku Rûsya di hemû siyasetên xwe piştgiya rejîma Sûriyê dike, bi tenê helwesta Amerîka diyar nîne, nemaze ku Amerîka niha di kawdanên bergihur “veguhê-

tina deştilatê” de derbas dibe, wekî me dît ku çawa ev kawadana demkî ji aliyê Bexdayê û ji aliyê parlamantoya wê ve wekî firsind û derfet li dijî Herêma Kurdistanê hate bikaranîn, her di vê çarçoveyê de, dûr nîne ku di navbera Rûsya, Tirkîye û rejîmê de lihevkerinek hebe ji bo guvaştinan bêxin li ser HSD ji bo radeşkirina Bozanê bo rejîma Sûriyê, bi bikaranîna heman derfetê û sûdwergirtina mijûlbûna rêveberiya Amerîkî bi encamên hîlbijartinên serokatîyê û veguhestina deştilatê, û heger Amerîka bêdeng bimîne, helbet wê rewşa Bozanê ber bi çarenivîseke reş biçe û dibe Tirkîyê deşt bi dubarekirina dagîrkeriyeke nû li dijî Rojavayê Kurdistanê bike.

Ji aliyekê din ve, tevî kiryarên vê dawiyê yê li dijî ENKS’ê û şewtandina ofîsên partiyên wê li Qamişlo û Derbêsiyê û êrişên li ser malbatên aliyên wê li Amûdê, lê dîsa berdewamiya diyaloga Kurdî-Kurdî ji aliyê “ENKS” û “PYD” ve hate piştraşt kirin, ku berî çend rojan ji aliyê nûnerê nû yê Amerîka yê taybet li Sûriyê “Joel Raybrunn” di serbazeke leşkerî de li nêzikî Hesekê bi awayekî cuda du civîn li gel şanda ENKS û PYNKS hatin lidarxistin, û nûnerê nû yê Amerîka tekezî li ser timamkirina piroseya lihevhatina kurdî kiribû, û li gorî nûçeyan ku civînen duqolî bi çavdêriya şandeke Amerîkî di navbera her du aliyan de piştî bi dawîhatina cejn û bihnevandanê sersala nû dê careke din berdewam bibin.



((Bozanê “Ayn Issa”: navê wê Bozanê ye ji hêla Hizba Beh’is ya deştiladar ve hate bi’ereb kirin bi navê “Ayn Issa” û bajarokekî kurdî ye û dikeve başûrê Girêspî li ser riya stratîjîk M4, û qezaya “Ayn issa” girêdayî parêzgeha Reqayê ye, û herwiha wekî paytexta “rêveberiya xweser” tê naskirin)).



Li bajarê Dîlok a Bakurê Kurdistanê teqînek qewimî

Li Nexweşxaneya Zanîngeha “SANKO” ya bajarê “Dîlok” a “Bakurê Kurdistan”ê teqînek qewimî û pêka zanyariyan di encama wê teqînê de 8 kesan canê xwe ji dest dane.

Nexweşxaneya Zanîngeha “SANKO” derheq bûyerê de daxuyaniyek belav kir û eşkere kir ku bûyer di beşa çavdêriya hûr a taybet bi nexweşên Koronayê de qewimiye û li encama teqînekê kepsûleke oksîjenê de agir berbûye wê beşê. Pêka zanyariyên wê nexweşxaneyê, di encama teqîn û şewitînê de, 8 nexweş ku 3 kes ji wan jin bûne, canê



xwe ji dest dane.

Navên kesên ku di encama bûyerê de canê xwe ji dest dane bi wî awayî ne: “Mehmet Reşîr Saydanoxlu yê 75 salî, Fethiye Kirca ya 78 salî, Naciye Ulûkutûk a 56 salî, Ebdî Hamzaoxlu yê 68 salî, Elif Akgul a 85 salî, Okaş Akbolût ê 69 salî, Kahraman Taş ê 71 salî û Ali Safet Canpolat ê 64 salî”.

Herwiha pêka daxuyaniya belavkirî, 14 nexweşên ku di wê beşê de, çareserî verdigirtin bo nexweşxaneyên din hatine veguhestin û derheq bûyerê de lêkolîn dest pêbûye.

Mangirtin di Kurdistan û Îranê de berdewam e

Kombûna mangirtina Ajotvanên kompaniya “Otobûsran” ya bajarê Urmîyê berdewam e û kedkarên bajarvaniya “Bender Ebbas”ê derheq rewşa kar nerizayetî nîşan dane.

Mangirtina ajotvanên Otobûsraniya bajarê Urmîyê di roja 3ê de berdewam e û ajotvanan dane zanîn ku heta daxwazên wan neyêne berçavgirtin û pirsgerêkên wan çareser nebên dê wê kombûna nerizayetiye bidomînin.

Herwisa 300 kedkarên Bajarvaniya “Bender Ebbas”ê derheq rewşa kar digel berpirsên

girêbestan nerizayetiya xwe nîşan dane.

Ew kedkarên bajarvaniya “Bender Ebbas”ê li pişka xizmetkariyên girêdayê xwezê û keskatiya bajarê “Bender Ebbas”ê de kar dikin ku zêdetir ji 3 mehan e heqdestên wan nedane û girêbestkar jî dest ji kar berdaye û kedkar bê heqdest mane.

Çendîn sal e ku wan kedkaran digel girêbestkarên cuda kar kirine û û piraniya wan girêbestakaran beşek ji heqdestên wan hêj nedane. Di demekê de ku pêka



madeya 41 a yasaya kar, zêdekirina heqdesta kedkaran li stuyê “Şewraya Bilind a Kar” e ku ji nûnerên kedkaran, xwediyên kar û dewletê pêk tê û herwisa zêdekirina heqdestê kedkaran li bûdceya sala 1400’an a rejîma Îranê hêj rohn nebûye û kedkar rastî dijiwartirîn rewşê hatine.

Aboriya îflaskirî ya rejîma Îranê li sala 1400an de, dê bo kedkaran hêj dijiwartir bibe, bi sedema ku asta rojreşî li Îranê ji %70an zêdetir bûye, di Îranê de bilintirîn asta cudatiya qatên civakî heye ku heta niha di Îranê de bêmînak bûye.

Kedkarên bendava Şinoyê û şaredariya Îlamê 7 meh in pereyê xwe wernegirtine

Kedkarên bendava “Çeperavê” a ser bi bajarê Şinoyê, 4 meh e ku pereyê xwe wernegirtine û xwedî karê wê bendavê li hegera karnekirina wan kedkaran gefa derkirinê ji wan xweriye.

Yek ji kedkarên wê bendavê ragihaniye: “Piştî paşkevîna mûçeyê 4 mehên kedkaran, xwedîkarê bendava “Çeperavê” gef ji kedkaran xweriye û em jî bo evê ku bêkar nebin, em neçar in ku berdewam bin li karkirinê di wê bendavê de.



Herwisa got: “Tevî paşkevîna pereyê me, em nehatine bîmekirin û beşek ji kedkarên wê bendavê bi awayekî girêbest kar dikin.

Ji aliyekî din ve, roja Duşemî 23ê Sermawezê, kedkarên şaredariya bajarê Îlamê bi sedema paşkevîna pereyê 3 mehan ji aliyê şaredariyê ve, hember bîniya dadguşterî ya wî bajarî kombûne û nerizayetiya xwe nîşan dan.

Nûçegihaniya “Îlîna”yê li vê derheqê ragihandiye ku hesabên malî yên şaredariya bajarê Îlamê, bi sedema sikalakerên taybet hatiye daxistin û pereyê wan kedkaran nehatiye dan.

Şanoya Kurdî wekî hunerekî Rojavayî



N: Niyan Berzencî

Pêşekî: Hunera şano (Theatre) herçiqas ku huner-eke Rojavayî tê dîtinê û li despêka peydabûna hevdem digel meşa modernîzmê di Kurdistanê de ye, lê hewceyî gotinê ye ku şano cuda ji wateya xwe ya îroyî, dikarin îşarê bi hindek karên nimayîşên kevin wek lîstok û gemeyên berê an ku yên dikevîne helqeya resma devkî bikin ku li tev deverên Kurdistanê, her yek bi awayekî tê xuya.

Lê di vê gotarê de, armanc ji şanoyê her heman wateya "Theatre" e ku li salên derbasbûyî hêdî-hêdî geşekirîye û çend salan carekê karnavel û fêstîvalên şano bi rê ve diçin û hevdem çendîn şanokar û şanonamenivîsên bikêrhatî yên me di wî warî de hene.

Dîroka şano: Her wekî me berê bas kir, ew huner wekî yek ji hunerên welatên Rojavayî, di despêka derketina xwe de li şarîstaniyên kevnar ya Yûnanê û Romyê ve ku xwediyên rewş û şewazên taybet bi xwe hebûn û digel guherîna serdem û civakên cuda, wê hunerê jî xwe nû kirîye. Ew huner li Kurdistanê li sala 1920an deşt pêkiriye û bi sedema hejmarek ji xalên bihêz yên siyasî di wan salan de heta sala 1957an dom hebû û piştî wunda bû. Di wî heyamî de nivîskar û rewşenbîrên Kurd bo nûjen û modernkirina tevcorên girêdayê civakê cehd dikirin û bi rola rojname û belavokan di wan salan de rengîngtir bû.

Şano li Kurdistanê, wekî hunerekî nîşandanê, di despêkê de bi navên wekî Tiyatroya Ewropî û Têmsîla Erebî dihate binavkirin. Lê pêka hindek belgeyan ku li helbestên helbestvanên sed-

sala 19an yên wekî "Mehwî" ku peyva "Tiyatir" têde xuya dike, em dikarin bibêjin, wê hunerê di wan salan de xwe bi Kurdan daye nasandin.

Dinya Tiyatro ye, meweşte tiya biro

Kê mayewe, nebûbê Tiyatro

"Mehwî"

Eva di demekê de ye ku ti helbestvanekî berî "Mehwî", ti îşareyek pê nekiriye û bo me derdikeve ku li despêka sedsala 20an, Kurdan jî ew huner naskiriye.

Herwisa helbestvanên piştî "Mehwî" yên wekî mamosta "Pîremêrd", "Zêwer" û ... hwd, her bi wan peyvan bas lêkirine; Lê bo cara yekem, mamosta "Goran" li helbesta "Cilweyê Şano" li dîwana "Firmêsk û Huner"ê de li sala 1950an bi cihê "Têmsîl û Tiyatro û ...hwd" û tev peyvên din yên biyanî, peyva "ŞANO" bikar aniye û piştî hêdî hêdî ew peyve cihê xwe li zimanê Kurdî de digre.

Binyata peydabûna şano di Kurdistanê de: Seha netewî Hatina modernîzma Rojavayî Rojname û rojnamevanî Qahîmbûna pêwendîya Kurdan digel welatên Rojavayî Bajarê "Stenbol"ê wekî pirek li navbera Kurd û xelkê Rojava, bo piraniya diyardeyên modern yên wekî şano, rojnamevanî, sînema û ...hwd, rolekî girîng lîstîye.

Rola rojname û kovarên Kurdî yên wê serdemê ku li "Stenbol"ê çap û belav dibûn, tevî ku kêr hebû belkî zêde jî bû heta li ser peydabûna yekem şanonameyên Kurdî rol hebûn ku Kurd bona bi pêşveçûnê han cehd dikir heta ku di dawiyê de şanoya Kurdî hate meydana.

Yekemîn şanonameya Kurdî

Berî sala 1919an, ti regek ji şanoya Kurdî nayê dîtin, ew jî di demekê de ye ku gelên derdora Kurdan bi taybet Tirk û Ereb, xwediyê ber-

hemên xwe yên şanoyan bûn û seba wê yekê heta astekî Kurd bi wê janrawa hunerî hatine nasîn.

Şano bo yekem car ji aliyê "Ebdulrehîm Rehmî Hekarî" ve li sala 1919an li Bakurê Kurdistanê li jêr navê "Memê Alan" ku biserhatî û çîrokeke dîrokî ye, hate berhemanînê û li sala 1920an de li kovara "Jîn" hate çap û belavkirin.

Her wekî me bas kir, "Stenbol" wekî pirekê di navbera Kurdistan û Ewropayê de bû, lewma piraniya nivîskar û helbestvanên Kurd yên tevdeverên Kurdistanê bona xwendin an jî bona dinya dîtinê ber bi wî bajarî ve diçûn û cihê deşt û tilî û pênuşa wan di varê rewşenbîrî û pêşketinxwaziya Kurdistanê de hebû.

Di dîroka wêjeya Kurdî de, em dikarin wekî yekem kesê ku şanonamenivîsî aniye li nav wêjeya Kurdî, amajê bi navê "Ebdulrehîm Rehmî Hekarî" bikin û wî pêgeha xwe li sala 1919an de dabîn kir û piştî ji yekem helbestvanên Kurdan e ku cor û şewaza helbestan bi awayê nû nivîsandine û endam û nivîskarê çalak û bikêrhatî ye kovara "Jîn" bû, ku bi giştî em dikarin bibêjin ku ji nûxwazên Kurd bi taybet li dîroka wêjeya Kurdî de tê naskirin.

Navbirî bilî zimanê Kurdî çendîn zimanên Ewropî û herwisa Tirkî û Erebî, Rûsî û Almanî dizanî û ji hindek peyvên wan zimanan di berhemên xwe de bikar aniye û herwisa em dikarin wî wek yekem hozanê Kurd ku şarezayê zimanên Ewropîyan bûye wî bi nav bikin. Yekem rexne li şanoya Kurdî:

Di dawîya sedesala 19 a zayînî, piraniya rewşenbîrên Kurd bo aliyê Îstebolê ve diçûn, yek ji wan mamosta "Pîremêrd" bû.

Çûna "Pîremêrd" bo "Stenbol"ê wekî xaleke bihêz a mezin di wêjeya Kurdî de tê naskirin, wî karî baştirîn

mifahê ji "Stenbol"ê vergire û xizmeteke berçav bo wêjeya netewa xwe bike; "Pîremêrd" bi rêya berhem û kovarên Tirkî ve û berevîrdkirana wan digel Kurdan, rêjêre xweş bibû ku bo geşeya zêdtir a wêjeya Kurdî hewlê bide û herwisa bi mifahvergirtin ji cih û pêgeha "Stenbol"ê bona bideştveanîna berhemên Ewropî û naskirina zêdetir wan, rewşeke cuda ya kultûrî û nûjêre afirandibû; Piştî tevlibûna wî bi kovarên Kurdî re û naskirin û hevaltîkirina hejmarek zaf ji şanonamenivîsan û rewşenbîrên Tirk û di bin karlêkeriya kovara "Serveta Funûn", karî piştî zivirîn bo Silêmaniyê, deşt bi nivîsandina şanonameyan bike û wê hunerê bi civaka Kurdî re bide nasandin ku hevdem digel şoreş û serhildana "Şêx Mehmed" bû; Piştî li 2 rojnameyên Jîn û Jiyan li bajarê Silêmaniyê ku xwe avakerê wan bû, bas û gotaran li ser şanoyê binivîse û belav bike.

"Pîremêrd" di despêkê de bi nasandina hunera şano wekî yek ji hunerên Rojavayî, berî her nivîserekê dinê karî pencereyekî nû bo xwaziyanê wê vebike û piştî digel rewşenbîrên Kurd yên Silêmanî, Hewlêr, Kerkûk, Musil û Bexdayê, digel her yek ji wan nivîseran û rewşenbîrên wê serdemê yên wekî "Huznê Mukriyanî û Husên Nazim, rexne ji şanoname û şanogeriya Kurdî bigrin.

Mamosta "Pîremêrd" bo cara yekem li sala 1927an li rojnameya "Jîn" rexne li ser şanoya "Nîron" ku ji aliyê girûpa qutabiyên bajarê Silêmaniyê ve hate nîşandanê girt û piştî rexne li ser şanoya "Serbazê Aza" li bajarê Silêmaniyê nivîsand, bi vî awayî nivîsandin û rexneya wêjeyî li ser şano (berê ji aliyê Şêx Nûrî Şêx Salih ve rexneya wêjeyî bi taybet li ser helbest, hatibû baskirin), tîne meydana wêjeya hevdem a Kurdî. Di raştîyê de em dikarin bibêjin "Pîremêrd" yekem rexnekarê şanoya Kurdî ye.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Welatiyekî Kurd li bajarê Dîwandereyê hate binçavkirin

Êvareya roja Sêşemî 25ê Sermawezê, welatiyekî Kurd yê bi navê “Aram Îsmaîlî” temen 35 salî û xelkê bajarê Dîwandereyê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo cihekî nexuya hate veguhaştin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî, êrîş kirine ser mala wî welatiyê Kurd û navbirî binçav kirine.

Heya niha lipeykevtina malbata wî welatiyê Kurd, bo agehdarbûn ji qeder û cihê ragirtina kurê xwe bê encam maye.

“Aram Îsmaîlî” xêzandar û xwediyê du zarokan ne.

Heya dema belavkirina vê nûçeyê ji sedem û tohmata ku bi ser wî welatiyê kurd de hatî sepandin ti zaniyariyek ji ber deşt de nîne.

Girtiyekî Kurd bi tohmata kuştinê li girtîgeha bajarê Seqizê hate îdamkirin

Îro Pêncşemî 27ê Sermawezê, girtiyek bi navê “Mihemed Muradî” xelkê bajarê Seqizê, li girtîgeha wî bajarî hate îdamkirin.

Tohmata wî girtiyê “qetl” bûye.

Termê wî girtiyê, radeştî malbata wî hatiye kirin û bi axê hatiye spartin.

Ew girtiye 5 salan beriya niha di encama şer û pevçûnê de li taxa 32 mêtî ya bajarê Seqizê, welatiyekî din yê bi navê “Elîekber-zahidî” kuştibû.

Ew welatiye piştî binçavkirinê, ji aliyê dezgeha qezayî ve bi îdamê hatibû cezadan û her li wê heyamê heta dema îdamkirinê di girtîgeha bajarê Seqizê de bû.

Serbazekî xelkê bajarê Şinoyê bo girtîgeha bajarê Urmiyê hate veguhaştin

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, serbazekî Kurd yê bi navê “Metîn Hesênwend” temen 20 salî kurê “Farûq” û xelkê bajarê Şinoyê, piştî bi dawîhatina heyama lêkolîna wî li yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hate veguhaştin.

Pêka ghotina çavkaniyeke agehdar, ew girtiye piştî veguhaştin bo girtîgeha bajarê Urmiyê, digel malbata xwe çavpêkevtin kiriye.

Herwisa wê çavkaniyê ragihand: “Ew ciwanê Kurd di yek ji padiganên bajarê Şinoyê de serbaz bûye, û mehek beriya niha bi tohmata “alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurd yên dijberê hikûmeta Îranê” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye binçavkirin”.

Wê çavkaniyê got: “Ew serbazê Kurd piştî binçavkirinê bo cihekî nexuya hatiye veguhaştin û di heyama binçavkirina wî de, ji deştê pêregihîştina bi parêzer û çavpêkevtin digel malbata xwe hatiye bêparkirin”.

Çavkaniya agehdar bi “Kurdpa”yê re ragihand: “Telefona wî serbazê Kurd, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye vekolîn û zevtkirin”.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê, “Metîn Hesênwend” di girtîgeha bajarê Urmiyê de qedera wî nexuya ye.

Welatiyekî xelkê bajarê Kamyaranê bi 10 meh girtîgeha teizîrî hate cezadan

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, welatiyekî Kurd yê bi navê “Roştêm Îbrahîmî” 40 salî û kurê Elî xelkê gundê “Textzengî” yê ser bi bajarê Kamyaranê ji aliyê taya 1 a dadgeha şoreş a bajarê Sineyê ve bi serokayetiya dadwer “Seîdî” bi 10 meh girtîgeha teizîrî hatiye cezadan.

Dadgeha şoreş a bajarê Sineyê ew welatiyê Kurd bi tohmata “hevkarîkirin û poropagende bo yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” ceza daye.

Ew welatiyê Kurd li deştê pêka meha Rezber a îsal bi tohmata “hevkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî yên dijberê hikûmeta Îranê” bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî bi dawîhatina heyama lêkolîna navbirî bi danîna barimteyê bi awayekî demkî hatibû azadkirin.

Berê, ew welatiye çend caran bo îdareya Îtîlaata bajarê Kamyaranê hatibû gazîkirin û hatibû lêpêçîn.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (388)

Yeldayek din hat

Yeldayek din hat

ŞEVA JIDAYÎKBÛNA RONAHIYEK

ŞEVA XWERAGIRÎ LI HEMBER DAGÎRKERAN

ŞEVA AWABÛNA TARÎTÎ Û DERKETINA TÎRÊJA ROJÊ



Dêzgaha Gêjtî ya Raghandina PDKî